



Ewlehîya Banke ya Serxetê

Em ji bo parastina ewlehîya we li dema pêkanîna danustandina bi rêya Banke ya Serxetê, şewazên ewleh bikar dînin ku bi başî hatine ceribandin û tqaî kirin. Tê şewazeke naskirina şexsî weli pênaseya Mobile Banke an pênasa nasnameya ewlehî, radest we bê kirin daku bê piştrast kirin ku bêguman hûn bixwe dikevî nava Banke ya Serxetê.

Em wekî banke û hûn wekî mişterî dikarin bihev re hevkarî bikin daku pêşî li xapandinê bigirin. Şewazên naskirinê ku ji aliyê we tene bikar anîn ji bo tîketina nava hesaba serxeta xwe, divê wekî belgeyên nasnameyê bêne zanîn. Hertim divê kode û şifreyên tîketinê bêne parastin û qet cem ti kesî heta bankeyê jî neyêne aşkere kirin.

Ji bo kêma kirina herî gengaz a metirsîya xapandina serxetê, dikarin xebatên jêr pêk bînin

- Herçarê ku şola we gel Banke ya Serxetê bidawî bû, ji sîstemê derkevin
- Lêgera malperê, sepna java û sîstema xwe berdewam rojane bikin
- Bernameya antivîrûs û firewalla xwe rojane bikin
- Şifreya rotera xwe ya malê da biguherrînin û şifreya standarda febrîkayê bikar neyînin

Ji bo kêma kirina herî gengaz a metirsîyên taybet bi pênasa nasnameya ewlehî, dikarin xebatên jêr pêk bînin:

- Hertim piştrast bibin ku jimareya kontrolî ku nava pênasa nasnameya ewlehîyê de dinivîsin
 - Eger li dema tîketina Banke ya Serxetê, hejmarek kontrolî û kodeya bersivê bikar dînin, pê 9 ê destpê dike. Dema ku pê bikaranîna kodeya yek-qonaxî dikevî nava sîstemê, ti hejmarên kontrolî, nayêne weşandin.
 - Ser esasa hejmara hesab an hejmara bankgiro/postgiro yê ye ku li dema tomar kirina kesek nû ku pere jêre tê şandin, vê lê dêxin.
 - Dema ku pêwîste rêjeyekê bo şandinê an dirav danê piştrast bikin pê 0 destpê dike (xênjî ku ev rêje hemberî 100,000 SEK an zêdetir be).

Li bîra we neçe ku banke qet ji were emailek naşîne û agahîyên hesabê an kodeyên we ji we napirse an ji we naxwaze ku bi rêya lînkê berdest di emailê, sepnekê daxîn an rojane bikin. Eger hûn bigumanin, peyama email an pelên pêvekirî, nevekin.

Agahîyên bêtir liser ewlehîyê

Agahîyên bêtir liser berpirsîya bankeyê û berpirsîya we di navnîşana [swedbank.se/sakerhet](https://www.swedbank.se/sakerhet) da hene, an gel xizmetên mişterîyên Banke ya Serxetê bi hejmara +46 (0)771 977512 pêwendîyê bigirin.

Her pirsên ku we liser sepna antivîrûs an firewall a xwe heye, kerema xwe gel dabînerê xwe pêwendîyê bigire.